Nawisk

Çand û hunerê me çawa dihên helsengandin?



Tehsîn Navişkî

Heçiyê li gel riyalîtê herêma Kurdistana azad kirî li va hevde salên dawiyê jiya be, wê jêre eşkira be, piraniya biyavên jiyana xelkê akinciyê herêmê, li ser mukumî û lawaziya havlyên kesokî dihê kirin.

Anko ew kes û layenên havaltiya bi hêz li gel hevdu hebe, wê jêre hemû şiyanan terxan bike. Dibe ev diyardeye ji yasa û zagonên xweristî yên gerdûnê be; heke ji bazinê xwe yê rewa dernekeve.

Helbete biyavê çand û hunerî ji vê diyardeyê bê behir nebûye. Wek ez li pirsgirêkê dinêrim; heke hemû biyavên jiyarê pêxemet peywendiyan werne (îstixlal) kirin, gereke çand û huner; wek samanê her gelekî bi wî şêweyî serederî li gel de ne hê kirin.

Lê mixabin evê nexweşiya domdirêj, li herêma azad kirî cîhana wêje û hunerê me jî vegirtiye. Em wê bibînin, gelek caran xwandevanekê

rexnegir, mijarê nivîskarekê herêmê yê afirandinane dixwîne yan mêze dike kevalê hunermendekî, yan her karekê din yê hunerî û têbîniyên rexneyê jêre peyda dibin û biyavê nivîsareka dahênanane jêre rohin dibe û şiyan hene li ser binivîse.

Tiştê kesê haydarî kêşeyê hêbetî! Dihêle, ev xwandevanê bi rexnegirê bi van tuxmên wêne û hunerî dihê niyasîn destpêşxeriya dariştina wan têbîniyên rexneyî nake; heke hevalê wî yan nasiyarê wî yên peywendiyên kesokî li gel de nebin. Demê hingê derket hevalê wî yê peywendiyan, helbet wê karê wî bifirîne ber esmanan û çavên xwe ji layenên nerênî dicîhana wêje û hunerî de wê bigire.

Hember vê nêrînê; heke hat û perasiya wî girt li ser karê êkê din yê ne niyas nivîsî, piraniya caran berovajî, wê karê dahênanî yê wî kesî helsengînit û wê çavên xwe ji layenên erênî bigire.

Eve heke hat û carekê ji caran, bi her rêka hebe, tiştek weha li ser têkistekî tu havliyên kesokî; li gel nivîskarê wî tuneyî nivîsî. Ha ji vir ez weha dibînim, tu caran bi vî dest û darî çand û hunerê me nikare berîkanê li gel çand û hunerê cîhanê bike.

Anko heke bizav û hewlên berdewam û dilsozane ne hên kirin ko em xwe ji vê diyarda nerênî rizgar bikin, ez bawer dikim, hêdî hêdî têkist û karên me yên çand û hunerî wê berev çarenivîsekê mijdar herin û zivirandina heybeta wan wê zor bi asteng bikeve.

Dibe ev bibe rastiyeka berçav bo her kesê xemê ji vê mijarê di xwe û barê giranê fîxan û hesretan helbigire. Em dibînin bazarê vê diyardê di qada çand û hunerê me de germe. Bi sedan têkistên tuxmên wêjeyî yên cuda cuda; herwesa rojane bi wî gojmey û dibe pêtir şakarên hunerî di hêne afirandin. Lê cihê daxê ye; ji bilî yên hinek heval û dostan, ew jî bi şêwekî erênî; wekî me li serî amaje dayê, piraniya van têkis û karên din yên dahênanî dibine dîlên toza çerxî û tu kes, ne bi erênî û ne bi nerênî xwe pênahîninder û li ser nanivîsin.